Mirov ji keran jî fêr dibin



21. April 2010

Dibêjin, rojekê gundiyekî kerê xwe yê pîr ji bin barê wî azad kir, kurtan ji ser piştê danî, hevsar ji histo şimitand û bi destê xwe, yê ku tilî wekî şivên mêweke havînê hişk bûne, tepek li pişta kerê xwe da, û gotê:"-*De here vehese, dostê min ê dirist. Ji xwe dostekî min ji te pê ve li ser rûyê vê zevînê nîne*"

Kerê ku teviya rojê bar li ser piştê bû, carina çiwalêd bi gênim dagirtî û carina parçeyên lat û kevirên avaneyê, dizanî ku ewê di axura tarî û bihin genî de, ji kayê bêtir tiştekî bo xwarinê nebîne, lê dîsa jî pir ji wê axurê hezdikir, ji ber ku kuriyê wî di wê axurê de dijiya, ew kuriyê, ku ji hezkirin û li gan ketina wî bi mankereka heşerî re, berî wê rojê bi sê salan pêda bûbû. Pişt re ew manker di hejariyê de nexweş bûbû, û di demeke kurt û kin de, paş jidayîkbûna kuriyê wî, miribû, û xudanê wê mankerê ew kurî dabû xudanê wî.

Li ber rohniya fenîskeke zeytê, ku di taqeke bilind de bû, çavêd kerê hejar û westiyayî li kuriyê wî ketin, ewê piçekî ji bavê xwe bi hêztir dixuya. Kurî pişta xwe dabû koma kayê, û seriyê xwe daxistibû, xistibû nav herdu lingêd xwe yên pêşîn.

Bav tirsiya, bi lez ber bi kuriyê xwe ve gavkir, û yekser bi zimanê keran ji wî pirsiya:

„-Kurê min, qey tu nexweşî?"

Kurê wî bersîv neda. Ker xemgîn bû. Carekê di dora wî re geriya, dît ku çi birînên lêdanê an yên geskirina kerekî dî li ser pişt û nava kurê wî nînin. Bi nermî pirsiya:

„-Qey zikê te dêşe?"

„-Na."

„-Qey tu ji hinekan hezdikî,an ji hinekan xeyidîyî?"

„-Ez ji kesekî heznakim. Ez ketime birçîbûneke mirinê."

„-Bo?"

„-Ez ji mirovan tevan xeyidîme."

„-Bo? Ma mirov giş wek hevin, tu ji tevan xeyidîyî? Xudanê me mirovekî pir qenc û dilê wî bi me disote, hema ew binzor dibe, ku barên xwe hildide ser pişta me."

„-Bo ew barên xwe hilnade ser pişta xwe? Qey em koleyên wî ne?”

“-Dengê xwe bilind neke, lo. De bêje min, bo çi tu ketiyî birçîbûna mirinê, û bo çi tu ji tevan sîv hatî?”

“-Baş e, ez bo bavê xwe dibêjim, hema li min zor neke, ku ez tiştekî bixum.”

“-Kuro, ma ji kayê pê ve çi li ber me heye, de bêje min, derdê te çiye?“

„-Derdekî min nîne, ez ji mirovan sîv hatime.“

„-Baş e, ez dizanim tu ji mirovan sîv hatî, lê bo çi?“

„-Ji zarokan bigir ta bi pîremêr û pîrejinan, gava ji hev dixeyidin, gotina wan a tev nebaş ewe, ku ji hev re dibêjin: Kero! An dibêjin: Qey tu kerî? An jî dibêjin: Werin guh bidin vî kerî…û her wusa.“

Bav piçekî di xwe de tengijî ji ber ku gotina kurê wî rast bû. Çengên xwe ji hev kirin, weku xewa wî ji nişka ve hat û didanêd wî yên mezin û dirêj xuya bûn… Lê ya rast ew bû, ku wî nizanî bû çi bersîvê bide kurê xwe.

Wekî em dizanin, tevî ku dibe ev zanîna me ne rast û diriste jî, mejiyê keran dereng kar dike, bi zûkî hişê wan naxebite…Wilo hatiye gotin!

Dawî bavê ku dilê wî bi kurê birçî mayî hatibû sotin, bi nermî gote kurê xwe:

„-Kurê min î ciwan, tu wekî min, li ser rûyê vê zevînê negeriyayî, tu sav û xavî, nepijiyayî, wekî naneke hîn di tenûrê de sor nebûye… Ez bi xwe bi kerbûna xwe, bi nijad û gelê xwe yê ker, serbilind im…“

Kuriyê ku baş guhdariya bavê xwe dikir, ji nişka ve gotina wî bi pirseke lezok û dengbilind birriya, got:

„-Çi?“

„-Erê kurê min, ez bi nijad û gelê keran serbilind im.“

Kur berken bû, weku çi caran ji bavê xwe bawer nedikir, rojekê bi wê bindestiya keran serbilind be. Xeyda wî ji nijadê keran jî çêbû, ji bav û ji gotinên bavê wî jî.

Bavê dil-, û sîngfireh gotina xwe gudand:

“-Binêre kurê min. Ma te rojekê dîtiye an bihîstiye, ku ker hevdu dikujin?“

„-Na.“

„-Ma te rojekê bihîstiye, ku kerekî an kerekê çûye gotinên nebaş li ser kesekî ji nijad û gelê xwe gihandiye fermandarekî dewletê?“

„-Na.“

„-Ma te rojekê dîtiye, ku ker bi hev re ketine cengê, an avêtine ser afirên hevdu, hevdu ji bona pençeke kayê, an ji bona qurfeke geya, di xûn û xirarê de hêştine?“

„-Na, bavo, na.“

„-Ma rojekê te bihîstiye, ku neteweyeke ji keran, bi top û kîmiya û atomê şûn û warêd hevdu wêrankirine, hevdu qirkirine, dayîk û zarokan, pîreker û pîremankeran tunekirine?“

„-Na, min ne dîtiye û ne bihîstiye. Tiştekî wilo li ba me keran nîne. Tenha carina du kerên mêr li ser mankerekê bi devgeza û bi pehîna li hev radibin, lê paş ku yekî delîve standin û bi mankerê re li gan ket û pişta xwe vehesand, êdî wan herdu ker dîsa bi hev re dibine dost û heval, û bi hev re di çêrgehê de dixun û dilîzîn.“

„-De bêje min, kurê min î ji mirovan sîv hatî, ka em baştir in an mirov?“

Kuriyê ku ji bavê xwe xeyidî bû, li rewşa xwe û ya gelê xwe hizirî, pir ji berê bêtir ji bavê xwe yê hoşmend hez kir, li gotinên xwe poşman bû, û bi du çavin reş û mezin, ku ji nişka ve tijî hêstir bûne, li bavê xwe yê hejar, pîr û westayî nêriya.

Bavê gotê:

„-De bixu kurê min, bixu… Rojekê bê, ev kayê jî nakeve devê me, ji ber zorbaziya mirovan û pevçûnên wan ên xûnî, wê nijadê me jî bite qirkirin û tunekirin, hema dîsa jî em ji wan çêtir in…bixu, em çi caran gotinên wan ên nebaş nabêjin, û wan ji li ser me gotin, bavêje paş guhên xwe. Ma qey ker ji wan kêmtir û nizimtir in?“

Kuriyê wî di cîh de histoyê xwe bada, rûyê xwe ber afirê xwe yê kayê kir, û bêdeng devê xwe avêtê, da zikê xwe yê ji taştiyan ve vala bûye, ji wê kayê dagire.